



DENGÊ KURD

26-Rêbendan 2712 k

15-2-2013 z

DENGÊ KURD -hjmar (2)

www.Pdksp.com

Komerîşkên (YPG)ê Hevbeşên Fîftî = Fîftî

2 « Şoreş Gorepana Hebûnê û Nehebûnê Ye

3 « Ka Gelê Xwe Dilniya Bikin

3 « Mafên Kurd li Rojavayê Kurdistanê



Bangewaz

Derbas bûna komerîşkên çekdar nava bajarê serê kaniyê bangewaza haydariyê vedide û li zingilê metirsiyê dide. em li himberî qewmaneke dîrokî bi gûlbijêrî rawestiyane, helwêstên bi ceger û biwêr pêdivîne, da ko em li gorî qewmanê pêngavêd rasteqîne bihavêjin liser rêbirên welatparêziya amêzkirî bi rêbaza barzaniyê her dem sax û nemirî. bangewaz haydariya hemû çîn û qatên (siyasî-civakî-rewşenbîrî) tev dide da ko livlivîneke rêxistinî lidarxîne ji çalakiyên gelêrî bi coş û xuroş li gorepanêd bajar û bajarokêd rojava yê kurdistanê, û wisa da ko kolana siyasî ya kurdî bi pîve û perwazên azadiyê vede û hilvede bi berû asoyên bervekirî. bangewaz bo her kurdekî şoreşgêr û çekdar da ko bi erkê xwenî netewî ve rabe û hilpeke gorepana şer û pevçûnê dema ko şerxwaziya çeteyan pêwîstî berxwedan û bergêriyê be, dê wê gavê emê serbest û azad bin û di nava rûpelên dîrokê de bin.

Desteya Nivîsgeriyê

Rojavayê kurdistanê



Filmê kurdi çêja Hingiv Yekemîn Bû


Rojavayê Kurdistanê (Şoreş û Berpirisyarî)

Lolo Xan



Roj bi roj şoreşa sûryayê dikeve tengaviyê, bûyer û qewmanên evê şoreşê rewş û kawdanên jiyarê berteng û tengezar kirine. Li bajar û bajarokên welat şer û pevçûn di navbera supayê rijêmê û supayê azad de gûr û dijwarin, bi hezaran kes dibin qurbanî, bi hezaran xanî tîn wêran kirin, bi hezaran karkir karên wan ji dest wan di çin, bi hezaran arîşe peyda dibin, qeyran û aloziyên abûrî û tenduristî û derûnî dinava civaka sûryayê de dizêtin û serî hildane, kambaxî û felaketan xwe berdane nav û hinavê hemû derav û warên jiyana mirov ya rojane. kurd û tevgera xwenî rizgarîxwaz gehîştin çî astî divê şoreşê de? gelo ew bi pêvajoyê re ne yan li paşin yan li tenîştê ne, gelo serbest û aza ne, û gelo hefsarê şoreşê û çareseriyên di destê wan deye. wa diyare ko kurd ne li astê şoreşê ne ji ber ko dubendî ron û eşkiraye û nakokî kûr û tîrin û rêkeftinên di navbera herdu encûmenan de

mane xîmav liser kaxetan, canê berpirsariyê hîna dûre ji hilgirtina karbendiyê, û pêjinîn û hest kirin bi pêdan û encaman xav û xulorin, negehiştine astê tewzandin û seridandinê ne bicî kirin û ne bi pêkanîna armanc û arazûyan kêşedoz û tevger ne liser astekîne, tevger liser dest û pengan milmilan û zoranbazî wê di kevêjin û tevger arîşe û nakokiyên ew dane destê helwêstên berjewendiyên birteng û xwazperest. û kêşe doz gelek tînerîn û dilxwazî wê terazû dikin di navbera livivîn û çalakiyan de dako helwest û berjewendî ji hev cuda bibin û hemû alîgir li gorepanê diyar bibin û lidar kar vekin. lê mixabin tev lihevî û pêlangêrî linav rastê û derdorê zorein-jibal dijberiya sûryayê û listebazên navherêmî ve. demekî kiriyara siyasî roj bi roj li rojavayê Kurdistanê sirt û newalek kûr radixîne di navbera gel û tevgerê de û wisa tevde dikevin sitmîkorekî aso nedîtî.



Ka Gelê Xwe Dilniya Bikin !

Diyar Ehmed

Wek tê zanîn gelê kurd ji demeka dûr ve dibin nîrê sitem û zordariya dagirkerên Kurdistanê de hemû rengên derdeserî û eşkenciyan kêşandî ye . evî gelê merd di dîroka jiyana xwe de ne tenê barê sitem û zordariya wan rijêmên dektator û xwînmij hilgirti ye. lê belê toşî gelek sîyasetên rêbazker yên regezperest û şovînîzîm hatî ye û herweha ji xêr û xweşiyên welatê xwe yên zehif û giranbûha bê par ma ye. tucarî di jiyana xwe de piştrast ne bûye û rojên rehet ne dîtîye, her û her bi tîrs û pîrsan re serê xwe daniye, ne şav û ne roj dilniya ne bûye. lê tevî giraniya barê wê sitem û zordariyê . birastî û ev rastî jî ji her kesî re jî diyare, ku dilê dilpak û cangoriyên vî gelî li ser rêya xebat û berxwedanê sar ne bûye û dilê wî ye gerim lêdaye û çavên wî li benda jiyaneke xweş û aram ne neqa ye, û tevana xewin û hêviyan ji bo azadî û rûmetiyê hûnandiye. Herkes dizanê ku dîwarên ker û bê deng yên zêndanên neyaran şahidin li ser çîrokên wê qênaxa reş û tarî, û dem wê bê, zincîra kom û dêza wan derdeserî û eşkenciyan li benderên welêt wê bîn dêran û hilkewaştin. Piştî wê dîroka dirêj îro ewrên reş û tarî ji hev vetqetin û di nav re jî hêsûyên rojîn xweş li esmanên bilind diçirîsin. Di vê derbarê de gazî û hawara gotinên nivîskarê kurdê navdar Hesên Hîşyar li ber guhên mirov deng vedidin ,

dîroka vî gelî û tûrê serpêhatiyên wî li ber çavan rêz dikin . dema di destpêka çerxa bîstan de digot: ((Dema derfet hebû em tune bûn, va îro derfet peyda bûye. lê mixabin em tune ne)) . Va dîsanê derfeteke di peyda bûye û ev derfeta zêrîn bi xutî destên xwe li deryê me didê, hişyar û razayên gelê me bi hev re wan ji xew ra dikê. Lê ka gelo, kurd ji vî derfeta zêrîn re amade ne û navmala kurdî bi rengekê rêk û pêk raxistî ye?. Ne veşartî ye kurd hene û ji her guhertinan re jî amade ne û hêza bi tenê ye, ku bi rengekê şaristanî hatiye rêxistin-kirin. cewazî û nakokiyên wan jî hene ,lê ne kûr û pîrin, Kuştin û xwînrîjandin di nav wan be, ta vî kelîkê çê ne bûye, û eger hişmend û rêberên vî gelî hişyarbin wê bikarin ne hêlin birakujî di nav kurdan de cih bigirê. Ta niha her tiştên di Buhara Erebî û şoreşa gelê Sûriyê de dikevin di berjewendiya gelê kurd û pêkhatiyên wê yên sitembar de û eger rêxweşker û serwerên gelê kurd li Rojavayê Kurdistanê, rêxistin û hêzên kurdan yên siyasî û şoreşgerî guhertinên serdemê bi rengekê rast bixwînin û li gorî encamên wan bixepitin. hingî wê bikarin bi rehetî û serbilindî gelê kurd bigihînin armancên wî û wê jiyana wî jî bi dilxweşî û seqamgêrî destpê bikê. tenê niha dermanê kurdan yekîtî û hevgerî ne, yekrêziya gelê kurd di vî

serdemê de wê gelek destkeftiyên hêja û bilind bi dest xwe ve binin ,û gerêke hêzên siyasî yên kurdî ji pêvajoya şerê birakujiyê yê Başorê Kurdistanê mifa û waneyan wergirin û dîsanê eger Bereya Kurdistanî berî serhildana (1991)ê ne hatiba damezrandin. di baweriya me de, gelê kurd û hêzên wî yên siyasî wê ew destkeftên mezin bi dest ve ne anîbana û ji xwe eger şerê birekujiyê li wir dest pê ne kirba, niha rewşa Kerkûk û Mûsilê wê ne ev rewşa ba û sînorê Kurdistanê jî wê îro firhtir ba, hêza kurdan wê bêhtir ba û destkeftiyên wan jî mezintir û pirtir ban. Vêca wek me berî nihajî da xuyanîkirin, va derfeteke zêrîn hat ye û ta niha kurd li ser xwe ne, û hemû merc û kewdan pêkhatî ne û li ber destin. Erê berî niha zanyar û siyasîmedarên kurdên Rojava digotin, ji ber çiyayên asê li Rojavayê Kurdistanê peyda nabin, ji ber wê yekê jî em nikarin têkoşîna çekdarî bikin, û şerê çekdarî pir zehmet û giran e. Lê va îro Bazê çiyayê Kurdistanê rêzdar Mesûd Barzanî serokê Herêma Kurdistanê bi hemû hêz û şiyânên xwe ve, bi ron û eşker e piştî gelê kurd li Rojavayê Kurdistanê girt ye û karî herdu Meclîsên kurdî (Meclîsa Niştîmaî ya kurdî û Meclîsa Gel a Rojavayê Kurdistanê) bigihîne hev û rêkeftina Hewlêrê di nav wan de imze bikê. Ev bi xwe destkeftiyek siyasî û isti-

raticî mezin û bûha ye. ji ber wê yekê jî pêtviye her kurdek tîgîhiştî û bîrewer, dilpak û merd, xemxwar û dilbêşê kêşa kurdî, vî destkeftiya dîrokî bi parêzê, ji ber parastina wê parastina mafê getê kurd e û pişfrastiyêke ji pêkanîna mafê wî ye rewa re. Ji ber wê jî, hêza xurt hê jî di destê gelê kurd û hêzên wî yên siyasî de ye û ev hêz wê mestir û xurtir bibê dema ku kurd destên hev bigirih û pabend bin bi tevaya xalên rêkeftina Hewlêrê bê kêma û zêde bûn. Ma ne ji mafê gelê kurd e ku piştî vî dîroka dirêj ji sitem û zordariyê , siyasîetên qirkirin ,binbirkirin û wêran kirinê, îro bi jiyaneke xweş û aram, dilekê rehet û bê kul û xem bijî, û serê xwe bi nerim û nazî deyinê, bê pîrs û tîrs, jiyaneke geş di welatek aram û seqamgîr de, ku yasa ser wer bê ,goftûgo û hevpeyvîn rêya çareserkerîna tevaya pîrsgirêk û aloziyan bê, û sindoqên dengdanê ew bi tenê dadwer bê ji mafê hebûn û xurt bûna her hêzeka siyasî re. Di nêrîna me de, eger hêzên siyasî yên kurdî yekdest û hevgerî bin. Wê ne tenê mafê gelê kurd pêkbinin, lê wê bibin piştgir û alîkar ji pêkanîna mafê tevaya pêkhatiyên gelê Sûriyê re û wê piştrastî bin ji jî Sûriya nû re, Sûriyak fireh alî, perlemanî, medenî, wek hevî û dadmendî bîngêh û nîşanên wê bibin. Ka va dem hatîye û vîca gelê xwe bi jiyaneke aram û dilxweş piştrast û dilniya bikin.



Şoreş Gorepana Hebûnê û ne Hebûnê ye

Şêrzad Osman

Li rojavayê kurdistanê jiyana mirovê kurd li rastî metirsiyê hatiye , lewra kêmasiyan serêxwe hildane , û pêwîstiyên qîlên xwe vesûtine , dêmekî tengavî û astengî bê şerm û fedî li kolan û gorepanan nêçîra rûmet û rewîstê mirovê dikin û wisa rûdêmê jiyane piçiriye . mal û malbatên kurdnişîn ketine ber destê bargiraniya buhayên kelûpelên jiyara rojane (nan – rûn – zeyt – şeker – heşînkayî – sotemenî) dêmekî şoreşa rojîyê û girêva deyxê destpêkiriye . bêkariyê nîgeranî û taswasên derûnî peydakirine , lewra mirov tewşomewşo bûye , hefsarê zêft û mestê ji destê wî derketiye , maye li wê hindavê dîl û matê azar û zînatên sextekar . mirovê kurd naçar bûye , rêçareyên pêvajoya jiyane bextreş û perêşanin , kevalên reşbîniyê nîgeran dikşînin li samalan li rûdêman , dêmekî asoyên hêviyan bê qidoş mane , lê hîna şoreşê gotina xwenî dawî ne gotiye . şoreş di qeyranê deye , şoreş di tengejeyê deye , şoreş di bazara berjewendî u viyanan deye , gelo ewê kî bi ser keve , gelê şoreşgêr yan rijêma zorgivêr , bê goman ew zoranzaziya deshel û pêşbîniyane , gorepana hebûn û nehebûnêye . dê her dem li ser ling û sengan bin û hişyar û wêrdarbin û alayên niştîman û azadiyê hildin li hemû kolan û gorepanan û sirûdên welatparêzî her vexwînin û her vexwînin



Mafên Kurd Li Rojavayê Kurdistanê

Mistefa Minle

Bê gûman gava em behs û lêkolîna Kurdistanê rojava bikin, divê berî her tiştî em hinekî li ser xaknîgarî, jîmartin û niştewerên Kurd wê rawestînin, û ji bilî rewşa aborî, çandî, siyasî û H.W.D. Vêca wek tê nasîn, Kurdistanê rojava perçakî biçûk e ji Kurdistanê mezî, lê li ba me hemû Kurdistanîyan girîngiyeke wê taybet heye, ji ber di dirêjahiya diroka gelê Kurd de, di hemû şoreşên Kurdistanê de, ev perçê biçûk alîkariya van şoreşan kiriye, çî bi xwîna xwe, yan jî di warê aborî û arîşenî de, bi gelemperî gelê Kurd di Kurdistanê rojava de, hejmartina wan digihe bêtirî sê milyon kes ku di sê herêmên sereke de dijîn, wek herêma Qamişlo, Kobanî û Efrînê bi hemû deverên xwe ve, lê belê di nav wan de neteweyên din jî li wir hene, wek Erebi, Aşûrî, Ermenî û Çerkes û H.W.D. Lê hejmartina wan kêman in, ji bilî vê gelek Kurd li bajarên din jî hene, wek Şam, Heleb, Reqê, Latqiyê, Hums, Hemê û li çiyayê Kurda li Sahêl û H.W.D. Bi tevahî xaknîgariya rojava wek berferhî nêzikî 20.000 K.M² e, ev herêmên naskirî bi navê Kurdan gelek bi xêr, bêr û havil in, wek çandina zad bi hemû cureyên xwe ve, û birên betrolê li pîr cihan û li deverên Qamişlo derketine, û li Efrînê bi milyonan darên zêtûnê û hemû cureyên meywe hene. Lê di warê lêkolîna bin erdî de li vê dawiyê hin kompaniyên Çînî behsa dîtin û derketina golên bêtrolê sivik û xazê li Efrînê kirine, bi gelmperî deverên herêmên Kurda dewlemend û sermiyandar in, lê mixabin Kurdên rojava ji hemû mafên xwe yê kerkirî û aboriyê bêpar in, ji dema ku Sûriya di bin destlata Firansa de bû, gelê Sûrî li dijî Firansa şer dikir, Kurdan li hemû deverên Kurdistanê rojava li tenişt birayên xwe yê Erebi wan jî di şoreşê de li dijî Firansa şer dikir, û qelenên buha didan, heya ku Firansa ji Sûriyê di sala 1946an de bi derdikeve, pişt re pîr ferwerîn û hukomet hatin damezrandin lê zû diherifîn, û gelek terqendeyên leşkerî li Sûriyê hatin çekirin. Di vê qonaxê de Kurdan pîr caran seroketiya komara Sûriyê kiriye. Di hundir vê pêngav û pêvajoya dirokî de du xal aşkere dibin, li hêlekê xuya dibe ku çavsooriya şovînistê Erebi li dijî Kurdan xort û tûj dibe, ji hêleke di ve li beramberî wê roj bi roj gelê Kurd pêdihesî ku zulm, zor û sitemkarî bargiraniyeke mezî xwe li ser pişt Kurdan tewzîm dike, di vê demê de hin çalakiyên Kurdan tînin kirin, mîna damezrandina hin komeleyên rewşenbîrî û civakî kar û xebata wan berdeyam dibû, heya digehe

sala 1957an ku di 14ê Huzêranê yekem car partiyek bi navê Partiya Demokrat a Kurdistanê li Sûriyê (Partî) tête damezrandin, hin bi hin Partî şewq û ronahiya xwe dide hemû herêmên Kurdistanê rojava, û cihên Kurd lê dijîn, vêca belav kirina hizr û rêbaza Barzaniyê nemir bi şeweyekî kûr, fereh û rast di nav civata Kurdî de xort dibe, heya em digihînin sala 1961an ku şoreşa Êlûnê, bi serkêşiya Cinêral Barzaniyê nemir dest pêdike, vêca Partî careke di bi hêz û xort dibe, û alîkariya şoreşê dike, di vê qonaxa han de di sala 1962an de çavsoorî û siyaseta qirêj careke di li dijî Kurdan tê ajotin, û biryara rêdana awerte ya hejmartinê derdixin hole ku nêzikî (150) hezar kes bê nasname welatî dihêlin, di sala 1963an de Partiya Behis ya diktetor digihe ser desthilatê heya digehe sala 1974an, dest bi kembera Erebi li herêma Qamişlo dike, li dirêjahiya (300)K.M û ferehiya 15 – 20 K.M Erebi (xemir) li wir belav dikin, û Kurdên resen û xwedî maf û netew di welatên xwe de pergende û biyanî dikin, di wê demê de erişên karbidestên Behis dest bi girtina komîta navendî ya Partî dikin û wan dikin zîndan. Li dirêjahiya (32) salan, di bin bandora şoreşên başûrê Kurdistanê û hemû bûyer û guhartinên dihatin pêkanîn çî li cihanê û yan li rojhilata navîn, Partî bêtirî carekê û duduyan perçe bûye, û ketiye pîr astengan heya sala 2004an, ku raperîna Kurdistanê rojava çik dide, ji Dêrikê de heya Efrînê di wê serhildanê de Kurdên rojavayê gelek şehîd dan. vêca di sala 2011an de û vir de dest bi bahoza şoreşên Erebi bû, ji Tonisê de dest pêkir heya Misir, Lîbya, Sûriya û di hundir vê şoreşa Sûrî de Kurdan xwe wek beşekî ji vê şoreşê didît, lê bi şeweyekî aştiyane ne bi çek û rextan, lewre bi dirêjbûna şoreşê û alîkariya Rûsiya û çînê ve bi Beşar El-esed re, rêjîmê karîbû li ser pîr kendiran bilîstana, çî di warê navdewletî de yan di hundir Sûriyê de, mînak karîbû şerekî rêgehî yî zir di navbera hemû şaxên nijadperest û olî de bikirina, û dixwastin Kurd û Ereban jî berdana hev, lê ti sûd û berhem ji wê yekê nedîtîn, di bin sî û bandora vê heyamê de û nakokiyên di nav dewletan de, hevbendiya hêzên dijber ya li dijî rêjîma Behis wan nikarî bû bawerî bi dewletên mezî re çekirina ji bo ku alîkariya wan bi lêxistîneke leşkerî bikin, mîna hevbenda (NATO) rêdaneke navdewletî bide biryar, lê di warê yekbûna hêzên hundirî de destpêkê de Encûmena Niştîmanî ya Sûrî çêbû, û komîta (tensîq) û

Komerîşkên (YPG) Pariyê Jiyara Hewwelatiyên Kurd Hevpişk Dikin

Dengê Kurd -Nûçesazî

Tengezariya kawdanên aburî û kêmbûna kelûpelên xorakî û sotemenî û nebûna derfetên kar û xebtinê jibo jiyara rojane ji hewwelatiyan re li deverên kurdî li rojavaê kurdistanê hişt ko gelek xort û genc berê xwe bidin sînorê başûrê kurdistanê jibo kirîna sotemeniyê ji başûr da bizîvirin bo firoştinê li rojava dako jiyara xwenî rojane pê derbaskin beramberî qazancek kêmbêr, lê mixabin liser sînorê hevbeş komerîşkên (ypg) hevpişkiya qazanca wan dikin ligor yasaya (fiftî fiftî 50/50). hewwelatiyekî binav (azad) daxwiyane û got ez nikarim rahêjim bêhtirî (30) litir benzîn himberî (600) lîreyên qazancîrî, lê ew (600) lire tene biniv kirin dinavbera min û (ypg) hewwelatiyekî din binavê (hozan) got: komerîşkên (ypg) sere her litrekî ji benzene (10)lîreyan dihavêjin ser weko xûkêti bê ko tu payerêziyê ji kurdîniê re yan hestrêziyê ji mirovatiyê re bigre û hilgire. hewwelatiyekî din binavê (dilgeş) got: (ypg) hevpişkiya me dike di her tiştî de ta di hêlimkêşanê de û jiyara rojane de bê tu yasax û sînordan û rêzgirtin ji reûş û kawdanên gelê kurd re li rojavayê kurdistanê, ew tîr naxwin bûne diz û rêgir, ewan cihê hêzên ewlekariya rijêmê girtine, bûne reheng û keftar û mafia li rojavayê kurdistanê. tîzanin ko komerîşkên (ypg) pabendin bi (pyd)ve, destên xwe danîne ser jiyana û jiyara gelê kurd li rojavayê kurdistanê dibin pesend û fermana rijêma esed de jiberî salekî û bêhtir ve



Ahengek Hunerî Xêrxwazî Li (Oslo)Yê Ji Bo Rojava Yê Kurdistanê

Ji ber rewş û kawdanên têkçûyî li rojava yê kurdistanê ji hemû alîyan ve (mirovayeti- jiyarguzarî- tenduristî) desteya hawarhatina kurdî li nerwîcê bi saya komeleya kurdên sûrya yê û bi hemahengî di gel gelek milbendên partiyên kurdistanî gelê kurd li (oropa) daxwazdike jibo amade bûnê li nav ahengeke hunerî xêrxwazî li (oslo)ya paytext li jêr duruşmê (bi hevra ji bona bi hewarveçûna gelê kurd li sûrya yê) da ko bergeştê evê

ahengê terxan bibe ji bo pêwîstmend û zarokan li deverên kurdî. çendîn hunermendên kurd evê ahengê di gêrînin ew jî evin (şevgeronî kerkûkî- mensûr kawyanî- qadir elîsay - nicman sindî - arazû omar zada- mizgîn lazgîn) digel koma lawan ya filiklorê kurdî û çendîn helbestvanên kurd. wekû tê zanîn ko ewan hunermendan be xorayî û canbêzarî ahengê digêrînin.



Çêja Hingiv

Dengê Kurd -Nûçesazî

Filmê (çêja hingiv) jibal derhênerê kurd ve (mano xelîl) padaşta yekemîn çinî û wergirt di mi-hrecana sînema niştimanî siwêsrî de di destpêka vê reşmehê de. çêja hingiv wê bê pêşan kirin liser dîtarên sînema di heivên dahatî de, ew berhemekî sêqolîye (fîrensî-siwêsrî-elmanî) çêja hingiv filmekî navdirêje, navdema wî (107) kêlikin bi zimanê kurdî û elmanî tê weşandin. çêja hingiv liser jiyana xwedî kerekî mêşêd hingiv ji kurdên bakûr di peyive, ewê ko her tişt ji destê wî çûye di navbera cenga lidar li bakûrê kurdistanê, paşî ko ew mezintirîn berhemkarê mêşêd hingiv bû li kurdistanê

mal û jin û zarokên xwe tevde windakirin û bûye derbêder û dînaner gihîştîye siwêsrayê wekû penaber û ji nûvde dest bi xwedî kirina mêşêd hingiv dike li çiyayên (elb)ê. komîteya dadbîrîne serpat kir liser sedemê pêdana padaşta mezin ji film re (di ser ko kesayetiya serekî toşî azar û felaketan bûye lê ew maye xwe ragir û wêrdar û xwedan behwerî û geşbînî û arênarî û wisa komîteya dadbîrîne tu birradekî bide liser ko kî sitemkare û kî yê sitemxware yan ko kî dijkare û kî yê qurbanîye. filmê çêja hingiv peyama geşbînî û pêkvejiyan û rêzgirtina hevbeş di navbera mirovan de cext û tekez dike.

Kurd Biwêr



min li esmanan sitêr dîn
lê sitêrek min ne bû
min li gulzaran şilêr dîn
lê şilêrek min ne bû
min li berwaran şikêr dîn
lê şikêrek min ne bû

min linêçirê kemendim
keys li mêşêrek hebû
şoreşa şewqa elendim
pêk li heldêrek hebû
şoreşa avaniyanim
rê li serdêrek hebû
şoreşa serkeftiyanim
dest li bendêrek hebû

kurd li Kurdistan û barzan
bîr li xasmêrek hebû
her bimînî her dimînin
kurd biwêrek her hebû
** loloxan **

Kurên Rojava (Vîdiyo Kilîp)




Kurên rojava vîdiyo kilîpekî kurdiye liser rewşa rojava yê kurdistanê sitranekê di lorine, ew hunerkarî ji gotinên helbestvan (arşev oskan)ê oxirkirî û ji awazên hunermend (zibêr salih) saz û tekûz bûye. çendîn hunermendên kurd yê rojava yê kurdistanê di vî hunerkarî de

beşdarî kirine û ew ji evin (evîna welat - ebas ehmed - zibêr salih - luqman cemil - şero betê - zihêr cemil - kerîm şexo - diyarî). tê zanîn ko ev vîdiyo kilîp ji sînyoyê (Selman Ahisên) û derhênana (sitêr ehmed) hatiye sazîrin.

Dengê Kurd -Nûçesazî

Damezrandina Govareke Cîhanî Ciyawaz Bi Navê (Gêrevêranên Kurdî)



Endamên tora kurdî jib o gêrevêranan, damezrandina (govara gêrevêranên kurdî) êşkere kirin bi zimanê (ingilîzî) bi serperîştîya çendîn perîfîsorên akadîmîxwazên alîkar ji kêşedoza kurd re ji taybetkariyên hemereng li seranserî cîhanê bi serokatiya perîfîsor (nartin van bîronsin) li zankoya (otrixt) ya holendî. govara gêrevêranên kurdî govareke nûjen û babetbijare di hemû taybetkarîyan de û navxwaze liser belavkirina vekolînên gulbijêrên payebilind ko pabendin bi kurd ve, û ji aliyekî

din ve bergeşt tèn pêşkêş kirin di warê gêrevêranên kurdî de ko armanc jê ewe beşdarî kirin di çalakî kirina vekolînan de û wisa ew bergeştên xwendekarî gêrevêranan berfirêh dîtin. ev govar komerîşkek firawan ji babetan di xwede vedihewîne wekû (abûrî- dîrok- civak - gan- kêmar-ramyarî- tenduristî- yasa - jîngeh - ziman - dezgehên ragihandinê - rewşenbîrî - huner - xwendekarî). tê zanîn ko hijmara yekê wê bête belavkirin (1)ê çirya pêşî (2013).

Dengê Kurd -Nûçesazî

